## Hilgirtina berpirsyarîya mûşterek

Ji dibisatnê û ji we be jî, ku zarokê We bi serfirazî timî here dibistanê. Hevkarîyeke baş ya di navbere We û ya dibisatana zarokên We de jibo vê yekê bingehîneke esasî ye.

## Dê û bavê hêja!

Destgirên vî proyektî lewma jî silav dikin, ku dibistanê bijartî tevî xebata vî proyektî dibin û ku dibistan bi We re lihevhatina liser tedbîran amade dikin, yên beşdarbûna zarokên We dema dersan de bi rêk û pêk dike.

Adresse/Navnîşan: Schulstempel


Landespräventionsrat Niedersachsen
– Niedersächsisches Justizministerium –
Am Waterlooplatz 5 A
30169 Hannover

Fon 0511 / 120-5255
Fax 0511 / 120-5272
Email info@lpr.niedersachsen.de
Internet www.lpr.niedersachsen.de


# Proyektê jibo timî zarok tevî dersan bibin

Niedersachsen

LPR NIEDERSACHSEN

Wezareta Saksonîya Jêrîn ya Kultur
Wezareta Saksonîya Jêrîn ya jibo Jinan, Kar û Sosîyal
Wezareta Saksonîya Jêrîn ya Hundur
Wezareta Saksonîya Jêrîn ya Huquq

Şêwira jibo Pêşîgirtina Suckirinê ya Saksonîya Jêrîn

## Dê û bavê hêja!

Em bi vî pelikê lihev pêċayî dixwazin bala We bikişînin, ku em bihevre xwe berpirsyar bibînin, da ku hemî şagirtî timî revî dersê bibin.

Lêkolîn şanî didin, ku netevlîbûna şagirtîyan ya dersê her ċiqas diċe zêdetir dibe û ev kare bibe destpêka nexwastina ċûna dibistanî. Ligor pirselêkolîneke di nava şagirtîyên sinifa 9 de ji nîvê şagirtîyan zêdetir gotîye, ku ew di nîvsala dibistanî ya dawî de rojekê anjî ji rojekê zahftir bê sebeb neċûne dersê. Hemabê 15 % ji yên pirskirî di nava vê demê de 5 rojan anjî zahftir bê sebeb ji dibistanê dûr mane.

Ev şagirtîyên ji dibistanê dûr dibînin, ne wisa ji dayîka xwe bûne. Ev prosesekî dûvedirêj e, heya ku şagirtîyek misêwa ji dersê dûr bimîne. Em dixwazin bi We re û bi dibistanê re bihevre lihember derkevin. Jiber ku ji dibistanê dûrmayîn qedandina dibistanê û hînbûna jiyana meslekekî girantir dike.

Hukumeta Saksonîya Jêrîn lewma jî proyektê „Jibo dibistaneke baştir – limber neċûna dibistanê û netevlîbûna dersê“ bipêşve bir. Di ċerċova vê daxwazê de hevkarîyeke nû di navbera welî û dibistanê de li dar xist, jibo ku tevlîbûna dersê ya hemî şagirtîyan were bi cî kirin. Encamên vî karî dê di praktîka tevayîyê welat de piştî sala 2005 werin berċav kirin.

Ev proyekt hemabê di 60 dibistanê di bajarên û mintîqên bijartî de bi tevlîbûna berpirsyarên dibistanî û meqamên jibo xortan hat pêk anîn.

Bi şikilê zanîyarî tespîtkirî (prensîpê tesadufî) dibistana zarokên We jibo ku tevlîbûna nava vî proyektî hat hilbijartin. Rêberîya proyektê ya zanîyar ji terefê Unîversîta Hamburgê ve tê kirin. Projekt di bihara 2004 de bi dawî tê.

Em ji We jibo alîkarîyê tîka dikin.

Ev jibo We wek welî û jibo dibistana zarokên We tê ċi manê?

## Dibistan û welî lihevhatinekê dikin

Zarokê We divê zanîbe, ku gava ew neċe dibistanê, hinge yekderb dibistan û welî bihevre dikevin girêdanê. Liser vê yekê welî û dibistan bihevre lihevhatinekê dikin. Dibistan bi vê yekê xwe berpirsyar dibîne, ku ew We wek dê û bav anjî welîyê ji terefê We ve kivşkirî bi telefonê agahdar bike, heke ku zarokê We bêsebeb neċe dersê. Hun jî berpirsyarîya xwe eşkere dikin, ku gava zarokê We nikarîbe here dibistanê, hingê Hun di eynî rojê de dibistanê liser vê agahdar bikin û telefonê We li cem dibistanê hebin, da ku ew jî biroj karîbin bi telefonê bigihîjin We.

## Tîmê piştgirîyê

Heke ku rojekê di dirumên arinzî de eşkere bibe, ku nehatina (neċûna) hin şagirtîyan ya dibistanê ji terefê dibistanê û dê û bavan ve nikare were ċareser kirin, hingê em dixwazin di ċerċova vî modelî de îmkanê vekin, ku destûra dê û bavê zarok anjî ya welî zarok jibo ċareserkirina van pirsên arinzî bi alîkarîya ekspertan mudahale bikin.

Ev ji xeynî mamostên dibistanan karin mesele xebatkarên dibistanî yên din wek pîskologen dibistanî, yên jibo alîkarîya zarokan û xortan, dixtorê dibistanî û hwd. bin.

## Hevkarîya polîsan

Di ċerċova vî proyektî de polîs (wek ku ċewa li gelek cîyan bi salan bi serfirazî dimeşe) berî nîvro xwe bigihîne şagirtîyan, yên ku ne li dibistanê ne. Ev gihîştin dê li derên civînên zarok û xortan yên neresmî wek qahwan, îstîyasonan anjî cîyên leyîstikan û dibistanê liser vê yekê were agadar kirin. Hevkarîya polîsan bitenê û bitenê di nava vê ċerċovê de tê kirin, ku berî sûc bên kirin, pêşîya wan were girtin. Hevkarîya ne ev e, ku polîs zaroka bi zorê bibe dibistanê.